

RÊBERA AHAGDARIYÊN
BINGEHÎN BERÎ QEYDKIRINA
DIBISTANÊ JI BO CIVÎNÊN DÊ Û
BAVAN ÊN PÊŞDIBISTANAN



RÊBER

Çapa
2024 an



Dayik, Bav û Perwerdekarên hêja,

Pirzimanî bi awayekî berbelav weke pareçeyekî jiyana rojane ya gelek malbatan heye. Nêzîkî nivê hejmara gelheya/nifûsa cîhanê pirzimanî ye. Li Almanyayê jî hejmara mirovên pirzimanî zêde dibe. Li Berlinê bi xwe hema hema ji her du zarokan yek bi pirzimanî mezin dibe. Ango di jiyana rojane de du ziman an ji du zimanan bêtir pirzimanî heye. Lewma divê li dibistanên me jî zimanê hemû malbatan bên danasîn û piştgiya van zimanan bên kirin. Ev nirxdayin ji bo zarok û malbatên wan dibe weke nîşaneyê rêzgirtinê. Dema helwesta ji bo zimanê dayikê erênî be, zarok pirzimanîya xwe jî binirx û hêja dibînin/têdigihêjin. Zarok bi berfirehkirina ziman, bi awayekî bixwebawer pêş ve dibe, zimanên din û heta hînbûna zimanên herêmî ji bo wan gelekî hêsan dibe.

Gelekî girîng e ku di civaka me de, ji serî de (ji destpêkê) piştgiya zimanê dayikê û zimanên malbatê bê destpêkirin. Di vê broşurê de, hûn ê bi piraî li ser piştgiya ji bo behremendiya angû şahrezayîya ziman gelek xal û agahiyên hêja bibînin. Dîsa di vê Rêberê de bi taybetî navnîşanên sazî û navendên piştgirî û şewirmendiya zimanê dayikê û pirzimanîyê dîkin hene.

Wek peywendîdara întegrasyonê, ji bo xurtkirin û birêxistinkirina zimanê we yê malbatê, ez dixwazim we dawetî beşdariyê bikim. Em li Berlinê ji bona pirzimanîyê bi hev re gavên baş û xurt diavêjin.

Katarina Niewiedzial

Berpirsîyara Senatoya Berlinê ya Întegrasyon û Koçberan

Dayik, Bav û Perwerdekarên hêja,

di sala 2021ê de bi guhertina Qanûna Dibistanan ya Berlinê re pêngaveke girîng hate destpêkirin. Bi vê biryarê li Berlinê, civaka koçber bêtir hat nasîn, cihêrengiya zimanan ya li vî bajarî û hînkirina zimanê dayikê li dibistanan wek gaveke girîng derket holê. Di vê pêvajoyê de bi taybetî sazî û rêxistinên koçberan roleke girîng lîstin û ji bo cihêrengî û pirzimanîya civakê di jiyane de zêdetir bê nasîn, xebateke bêwestan û hêja kirin.

Ev pirtûkok (broşur) encama xebat û çalakiyên pisporî yên “Navenda Dibistanan û Pêşdibistanê (Zarokxane / Baxçeyê Zarokan) Pankow ya Dayik û Bav” e. Di sala 2022an de bi pêwendîya hevkarîya pirzimanî li Pankowê Roja Zimanê Dayikê ya Navnetewî hate lidarxistin. Armanca vê broşurê ew e ku ji bo amadekariyên perwerdeya sala 2023/2024an, we agahdar bike. Di derbarê pirzimanîya zarokan de û di dema xwe de bi awayekî zelal agahdarbûn û li gorî vê xwe amadekirin, girîng û pêwîst e. Rêxistinên me yên koçberan di bin banê Tora Ziman Pankow de ne, ji bo we alîkariyên girîng dikin.


Em danasîna komeleyên ji bo malbat (dê û bav) û zarokan yên li navçeya me dikin. Wek Saziya Navçeya Întegrasyonê komelên Pankowê, piştgiriya hewldanên li dibistanan ji bo pirzimanîyê em bi rêzdarî dinirxînin û we dawetî xwendina vê broşurê dikin.

Buroya Navçeyê ya Întegrasyonê Pankow

**Ji dayikbûnê hetanî
dibistanê
bi zimanê dayikê**

RÊBERA CIVÎNÊN DÊ Û BAVAN LI PÊŞDIBISTANAN ÊN BERÎ QEYKIRINA DIBISTANÊ JI BO SALA 2024 AN

KESÊN KU ŞANSÊ WAN YÊ HILBIJARTINÊ HENE...



HÛN BI XÊR HATIN

Dayik, Bav û Perwerdekarên hêja,

Di 27ê 27. 2021ê de Qanûna Dibistanan ya Berlinê hat guhertin. Niha navê xala qanûnê ya pazdehemîn ku hatiyê guhertin, wek “teşwîqkirina duzimanî û pirzimaniyê” tê binavkirin. Ji bo zarokên ku di malbatê xwe de bêyî almanî bi zimanekî din jî diaxivin, ev tê wê wateyê ku êdî ew dikarin, zimanên xwe yê dayikê li dibistanan hîn bibin. Bi vî awayî êdî zarok ne tenê bi zimanê xwe yê herêmî/devokî, di heman demê de ji bo pêşerojê jî di astekê bilind û berdewamiya perwerdeya bilind de jî bi devîkî û nivîskî zimanê xwe yê dayikê bi pêş bixin. Ev derfeteke nû ye û mirov nikare, li derî dibistanan li her derê vê derfetê bi hêsanî peyda bike. Ji bo teşwîqkirina pirzimaniyê, hûn jî dikarin bi lezgînî têkevin nava tevgerê û vê derfetê bikin pêngava pêkhatina pêşketinê.

Ji ber vê yekê bi pêşengî û însiyatîfa rêxistinên cuda yê di nava Tora Lingua Pankow de ne, ji bo alîkariya lidarxistina civînen dê û bavan, hatina ba hev û qeydiyên dibistanan, ev Rêber hatiye amadekirin.

Em ji zarokan re di pêvajoya jiyana nû de destpêkeke xweş dixwazin û bi hêviya girtina biryarên baş.

Monika, Laura, Rachel und Marita

Tîma ORGA ya Rêberê - Lingua Pankow

NAVEROK

5 Destpêka dibistanê - di pêşveçûna zarokan de gaveke mezin

6 Dibistana berpîrsiyar!

7 Îro dibistan

8 Mijara me ya sereke! - li dibistanên Berlinê ziman

10 Qeydkirina dibistanê - divê biryara çi bê dayin?

11 Muayeneya bijîşkî/doktor ya ji bo dibistanê

12 Pêşniyarên ji bo amadekirin û lidarxistina civînên dê û bavan



13 Li pêşdibistanên pirzimanî civînên dê û bavan ên ji bo komikên bi almanî û zimanê malbatê yên cuda diaxivin

15 Civînên dê û bavan ên li pêşdibistanên yek an pirzimanî

17 Pêveka materyalan

22 Pêwendî ji bo şêwirmendî, piştgirî û alîkariya pîrsên li ser pirzimanî û zimanê malbatê

DESTPÊKA DIBISTANÊ - DI PÊŞVEÇÛNA ZAROKAN DE GAVEK MEZÎN

Li Almanyanê mafê zarokan yê perwerdeyê heye. Ji ber vê, çûna zarokan ya dibistanê mecbûrî ye. Ango di tebaxa 2023 an de zarok wê biçin dibistanê (1). Heta ku zarok bigihêjin temenê bîrbir yê qanûnî, dê û bav berpîrsiyar in ku zarokên xwe bi rêkûpêk bişînin dibistanê û hinek biryarên di derbarê perwerdehiyê de bidin. (wek mînak hilbijartina dibistanê û zimanên biyanî, dibistana navîn an dersên bijarte yên mecbûrî) - Berê dê û bav bi tenê û paşê jî li gorî temenê zarokan bi zarokên xwe re biryara berdeyamî û awayê perwerdeyê bi hev re bidin).



DI JIYANÊ DE HER DEM DU RÛ / ALÎ HENE:

“

- yek 😊 - êdî ew zaroka/ê dibistanê ye! û yek jî ☹️ - xatirxwestina ji hevalan û tirsê li hemberî nenasî û nûbûnê ye.

Lewma, amadekirina ji bo vê pêvajoyê pir girîng e. Di sala dawîn a pêşdibistanê de, di nava bernameya pêşdibistanê de roleke vê pêvajoyê ya taybet heye. Hin caran zarokên heta destpêka meha cotmehê û yên di 30ê îlona 2023an de temenê wan bibin şeş salî, divê ew ji bo dibistanê werin qeydkirin.

Dê û bavên her komika pêşdibistanê divê bicivin û bi hev re bifikirin ku kî wê bi kê re dest bi dibistanê bikin, da ku zarok di vê pêngava ji bo wan mezin û nû ye de neçar nemînin bi tenê gavekê biavêjin.

(1) Qeydkirina pêşdem an jî qeyd bi paşxistin, tenê ji bo hinek rewşên taybet ên awarte/îstisna heye û divê malbat (dê û bav) di derbarê vê mijarê de ji şewirmendiya taybet sûdê bigirin.

Zarokên di vî temenî de ji bo pêngava destpêka dibistanê, alîkariya ji bo wan di serî de berpirsiyariya mezina ye. Di dibistana navîn û bilind de êdî rewş bi tevahî tê guhertin û dibe tiştêkî din.

*Em teqez pêşniyar dikin, **berî qeydkirina dibistanê**, hûn zarokên xwe bibin lêgerîna dibistanan. Beşdariya van çalakiyan ji bo zarokên di vî temenî de, hewcedariyeke gelekî taybetî ye.*

Serlêdanên li herêma pêşdibistanan, her dem ne bi fêde ne, ji ber ku tenê hinek zarok li wir tên qeydkirin. Ji bo pêşdibistanan qadên komkirinê tune ne. Lewma divê hîn ji zarokên pêşdibistanan re pêrebûn hewce ye. Ji ber vê yekê jî divê di dema pêkan ya herî nêzîk de, zarok bêyî ku hewcedariya navgînên ajotinê (tirimbêl/suware ûwd.) karibin bi serê xwe biçin dibistanê.

DIBISTANA BERPIRSIYAR!

Di meha îlonê de wê ji malbatê re ji aliyê "dibistana berpirsiyar" nameyek bê şandin. Ev dibistaneke ku herêma/navçeya hûn lê dijîn e. Li derdora her dibistanekê "nexşeya bajêr" ya biçûk heye û ji bo zarokên ku li vê navçeyê dijîn, ev dibistana sereteyî ya berpirsiyar e. -Her çiqas dê û bav, dibistaneke din ya cuda bixwazin jî- ew mecbûr in, berê zarokên xwe li wê dibistana hatiye destnîşankirin qeyd bikin- Li wê dibistanê ji bo zarokan cihêk tê/hatiye veqetandin. Heger malbat dixwazin zarokên xwe li dibistaneke din qeyd bikin, divê berê li dibistana ku berpirsiyar hatiye diyarkirin qeyd bikin û dawiyê jî ji bo "dibistana ku ew dixwazin" dikarin formeke din ya serlêdanê dagirin. Cihê tê diyarkirin ji bo zarokan ewle ye. Cihwarbûna malbatan li ku derê be, li wê derdorê ji zarokan re cihê tê veqetandin. Ji bo cihê malbat dixwazin ku zarokên xwe bişînin wê derê, ew girêdayî ku li wê dibistana tê xwestin, cihê vala heye an na. Li gorî rewşê hin daxwaz bicih tên hinek jî zahmet e, an ne diyar in.

ÎRO DIBISTAN

Î

Hînbûna xwendin, nivîsandin û hesabkirinê li dibistanê ne cara pêşî û ne tiştêkî nû ye. Lê belê, piştî dê, bav û perwerdekar diçin dibistanê, jiyana dibistanê û şiklê pêkhatina dersan tê guhertin. Hinek dê û bav ji ber zarokên xwe yê mezîn, ji xwe bi vê rewşê dizanin, bi perwerdekar û dibistanê nêzîkî xwe de têkliyên wan hene û xwedî agahî ne.

Çarçoveya plansazî û bernameya perwerdeyê ji bo hemû dibistanên li Berlinê derbasdar e. Rêbazên hînkirinê ji aliyê mamosteyan ve tene destnîşankirin.

Dibistanên Berlinê dibistanin berfireh in. Di dibistanan de zarokên bi astengî/seqet jî hene (2). Dîsa dibistanên sereteyî yê ji bo hewcedariyên taybet hatine avakirin jî hene. (3), û heke dê û bav bixwazin ji bo van zarokan li dibistanên taybet cih heye. Li gel vê di heman demê de hinek derfetên azadiya afirîner jî hene, mînak dibistan dikarin, du an sê polên/sinifên pêşîn bi hev re plan bikin, ji van re komikên polên tevlihev (JÜL) tê gotin. Di pêşdibistanan ango di kreşan de jî vê re komikên/grûpên temenê tevlihev tê gotin. Ev awa dikare ji bo hînbûnê gelekî bikêr be. Zarok ji zarokên din jî hin tiştan hîn dibin û carinan yê biçûk û carinan jî yê mezîn di rolguhertinê de dikarin ji hev sûdê werbigirin.

Di nirxandina performansê û lînerîna piştî dibistanê de hinek cudahî hene. Hinek dibistan taybetiyên wan cuda yê mîna taybetî wek beşdariya ziman, an tevlêbûna muzîkê an jî ya werzîşê/sporê xwedî taybetmendiye cihê ne. Ev taybetmendî di malperên înternetê yê dibistanan de û di broşura bi navê "Qeydakirina dibistanê - bi vî awayî tê çêkirin!" de dikare bê peyda kirin/dîtin. Ji bo dê û bav karibin karên xwe bi hêsanî berdewam bikin, li hemû dibistanên sereteyî yê li Berlinê ji bo zarokan lînerîna piştî nîvroj heye. Li dibistanan sibehan, danekî rojê, demjimêr/ saet ji 7:30 heta 13:30 an û danê êvarê jî saet ji 7:30 heta 18:00 an zarok dikarin tevahiya rojê li Dibistana Rojane (Ganztagsschule) bimînin. Heke hewcedarî hebe lînerîna zûtir an derengtir jî dikare hebe. Hemû zarok dikarin li dibistanê xwarina navrojê belaş bixwin. Bi gelemperî ji bo mirov karibe dibistanan nas bike, dibistan rojên danasîna dibistanan li dar dixin. Em teqez pêşniyar dikin, hûn beşdarî Rojên Danasîna Dibistanan bibin û jî vê derfetê sûdê bigirin.

(2) Hûn dikarin ji Navenda şewirmendiya dibistanê ya piştgirî, tevlêbûn, pedagojî û psîkolojiya dibistanê (SIBUZ) pêşniyarên pisporî bigirin. (Li materyalên di pêvekê de ne binêrin) û dîsa li wir pêşniyarên ji bona dê û bavan li ser însiyatifên malbat (dê û bav) agahî û tawsiye, sîrê û pêşniyarên guncaw jî hene.

(3) Li "Qeydakirina dibistanê - pêvajoya çawa pêk tê" binêre (3) siehe "Schulanmeldung - so geht's"

MIJARA ME YA SEREKE!- LI DIBISTANÊN BERLINÊ ZIMAN

Heya nuha, ziman wekî zimanên almanî û biyanî hatine fêmkirin. Lewma bi tenê çend dibistanên pirzimanî hene û piraniya wan jî dibistanên taybet in. Di sektora pêşdibistanan (Kita) de, bi piranî însiyatîfên dê û bavan pêşdibistanên duzimanî an pirzimanî ava kirine (4).

Di rewşa asayî/normal de li dibistanên Berlinê hînkirina zimanên biyanî bi gelemperî di pola sêyemîn de tîndestpêkirin, ango îngilîzî û li hin dibistanan jî fransî (5). Lê li gelek dibistanên sereteyî berî vê zimanê îngilîzî wek kêfxweşî û lîstîk jî pêşkêş dikin, da ku zarokên malbatên bi îngilîzî diaxavin karibin bi awayekî hevgerî zimanê xwe yê malbatê pêş ve bibin (6).

PERWERDEYA DUZIMANÎ

Li Berlinê hinek dibistanên duzimanî yê taybet hene (almanî-îngilîzî, -fransî, -rûsî). Bêyî van, li sê dibistanê dewletê yê sereteyî xwendin û nivîsandina duzimanî û perwerdeya almanî-tirkî (ZWERZ) li sê dibistanên sereteyî yê giştî (7) tê dayîn. Li van dibistanan zarokên ku beşdarî dersên tirkî nebin jî dikarin beşdarî koma tirkî bibin. Ev derfeteke taybet e. Ji bo zarokên zimanê dayika wan almanî ne, dikarin tevî zimanê îngilîzî, zimanekî biyanî yê din jî bibin.

DIBISTANA EWRÛPA YA DEWLETÊ - LI BERLINÊ - SESB

Li Almanyayê, mîna keke bêhempa û gelekî taybet, ev dibistan in, ku ji kombûyina 9 zimanan pêk tên: almanî-îngilîzî, fransî, polonî, spanî, tirkî, rûsî, portekîzî, îtalî û yûnaniya nûjen. Ev dibistanên ku ji aliyê rêxistinî ve bi dibistanên giştî yê wek şemendefir/trênê ve girêdayî ne. Dibistan tevahiya rojê bi hev re di nava pêwendiyê de ne. Qadên van dibistanan ên komkirinê tune ne. Ji bo zimanê almanî wek zimanê hevpar prosedurek heye. Ew bi taybetî ji bo dibistanên rojane yê duzimanî balkêş e. Lê mixabin li Pankow ev model (SESB) hîn tune ye. Ev tê wê wateyê ku ji bo vê hîn heta demekê divê ev pêvajoyê bibe payin.

(4) Têgîna pirzimanî bêtir li pêşdibistan ji bo piçandîtiya di navbera çandan de tê bikaranîn. Ev tê wateya ku li dibistanê, axaftin an hînbûna ji zimanê netewî yê almanî bêtir zimanên tîndestpêkirin û hînbûn.

(5) Heke bi hejmareke ku têra avakirina komikekê bike (kêmtirîn 15 zarok) hebin û dê û bav daxwaz bikin, dikarin zimanê xwe hilbijêrin. Dema komik hînbûnê bê avakirin, dê û bav dikarin zarokên xwe ji bo dersa ziman qeyd bikin û ev perwerde bi kêfxweşî dikare mayinde were berdewamkirin.

(6) Taybetmendiyêke din jî li dibistana John F. Kennedy ya almanî-îngilîzî li Zehlendorfê ye. Pêwendî: <https://jfks.en/?lang=de>

(7) Agahiyên hewce, di broşura "Qeydkirina dibistanê - pêvajoyê çawa pêk tê" de hene.

NÛ: DERSÊN ZIMANÊ YEKEMÎN (8) DERSÊN BI ZIMANÊN DAYIKÊ AN ZIMANÊ MALBETÊ

Piraniya zimanên dayikê tenê li kêr pêşdibistan û dibistanan heye. Li hinek dibistanên navîn jî wek zimanê biyanî yê duyem an sêyemîn hene. Asta pêşkevtina zimanê xwendekarên ji malbatên pirzimanî tên û ya xwendekarên alman êdî wek asta pêşkevtinê ji aliyê ziman de di navbera wan de hevsengiyêke zêde tune.

Lê belê ji bo dersên zimanên dayikê an zimanên zikmakî jî aliyê polîtîkaya perwerdeyê de balkêşiyêke civakî heye. Pirzimanî êdî di qada cîhana gerdûnî de wek hewcedarî û binirx tê dîtîn û teşwîqkirin. Hînbûna zimanê dayikê ji bo pêşkevtina zarokan ji aliyê zanistî ve jî êdî ne wek astengî, berevajî vê weke alîkarî û piştgirî hatiye îspatkirin. Bi guhertina xala § 15an ya Qanûna Dibistanan li Berlinê, li gorî hin mercan ji bo dersên zimanê yekemîn/zimanê dayikê, rayedarên dibistanan dikarin perwerdeya zimanê dayikê saz bikin. Heya nuha ji bo dersên zimanê dayikê di hefteyê de du (2) saet hatine plankirin. Dersên zimanê dayikê ji derveyî dersên asayî bi piranî piştî nîvroj pêk tînin. Ji bona avabûna komeke hînbûna dersên zimanê dayikê, divê herî kêr 12 xwendekar bînin qeydkirin. Heke personel û pêdiviyên darayî yê guncaw pêk werin, komikên hînbûna zimanê dayikê, dikarin piştî agahdarkirina hewcedariyê ji aliyê rêveberiya dibistanê ve bînin saz kirin. Ji bo damezrandina komên zimanê dayikê, heke hejmara xwendekaran ya hewce (15 zarok) li dibistanekê tunebin, dikare ji dibistanên cîran yê nêzî hev komik werin avakirin û komik ji polên ji hev cuda, tevlihev jî bînin amadekirin. Li Berlinê ev çend sal in li hin dibistanan ji bo dersên zimanê dayikê derfet heye; zimanên erebî, tirkî û nuha jî dersên zimanên kurdî, polonî, rûsî, ûkraynî û wietnamî hene (9).

Hînkirina zimanê yekem/zimanê dayikê li Berlinê nû dest pê dike. Ji ber vê dê û bav di dema ku zarokên wan hînbûn li dibistanê ne, dikarin, tev li van dersan bibin. Di heman demê de zarok dikarin bi komeke xebatê ya li qada derveyî dersê, piştî nîvroj an jî wekî dersên bijartî yê mecbûrî (WUV) di polên 5-6 an de jî dest pê bikin. Heke dibistan, dê û bav bi hev re bixebitin, dikarin vî karî xurt bikin û pêşve bibin.



(8) Di hin belgeyan de ev tîgîn hînbûn jî wek "dersên zimanê dayikê" (HSU) tê bikaranîn.

(9) Dibistan û ziman di broşûra "Qeydkirina dibistanê de - çawa pêk tê" hatine rêz kirin.

QEYDKIRINA DIBISTANÊ - DIVÊ ÇI BIRYAR BÊ DAYIN ? (10)

Bi gelemperî, dibistanên sereteyî yê li Berlinê dibistanên danekî rojê/nîvrojê yê pêbawer in, ango dibistan sibehan saet ji 7:30 heya 1:30ê ji bo hemû zarokan vekirî ne. Dema qeydkirinê

dê û bav ji ber rewşa karê xwe dikarin, saet ji 06:00 heya 16:00 an ji 06:00 heya 18:00 an qeyd bikin û di dû re forma serlêdanê ya lênerîna zarokan dagirin.

Hemû zarok dikarin tevî xwarina navrojê/firavîn ya belaş bibin. Ev di dema qeydkirinê tê pirsîn.

Dê û bav li gorî xwesteka xwe divê biryar bidin ku ew dixwazin zarokên wan beşdarî dersên olî / dînî yê bijarte an jî dersa zîrektiya jiyanê bibin an na.

Heke dê û bav bixwazin, zarokên wan ne li dibistana sereteyî yê wek berpirsiyar hatine diyarkirin, biçin dibistaneke din, divê di dema zoraka/ê xwe li dibistana sereteyî ya berpirsiyar qeyd dikin serlêdanê ji bo dibistana din ya dixwaze bike. Ev xwestek dê dikare pêk were yan na, ev li gorî li dibistana tê xwestin, hebûna cih e. Ji bo misogerkirina dadmendiye, ev di pîvanên prosedura pejirandinê de hene (11).

Di destnîşakirina dibistanên berpirsiyar yê ji bo zarok biçinê de hema bi qasî ku derfet hebe, dibistaneke ji bo têkiliya dê û bavan hêsantir, cihekî nêzîk û heke xweh û birayên zarokan lê bin, tèn plankirin.

Lê di heman demê de wek tevahiya rojê (Ganztagsschule) dibistanên sereteyî yê bi bernameyeke dibistanên taybetî jî hene. Mîna dibistanên bi giranî li ser muzîk an hunerê an werzîşê an jî bi taybetî giranî li ser zimanekî jî hene. Taybetmendiyeke din ya dibistanên Berlinê, dibistanên civakê hene, ku ji polên 1-10 an dibistanên berfireh in. Hinek ji van dibistanan jî hetanî amadeyî/lîseyê (Abitur) ne, ku di van dibistanan de guhertinek din ya hewce çênabe. Lewma ev neguhertina dibistanê dikare di dema aloz ya kamilbûnê de bibe hêsaniyeke mezin.

Heke hûn ne li herêmeke dibistanek wisa bi bernemeya van taybetiyan dijîn, divê hûn dema li dibistana sereteyî ya berpirsiyar qeydê çêdikin, hûn dikarin serlêdanek ji bo vê perwerdehiyê bikin.

(10) Sedemên xwestina armanca dibistana sereteyî bêyî dibistana berpirsiyar, ji bo yê taybet dikare di pêvekê de, Qanûna Dibistanê xala § 55a) an û di rêzîknameya dibistana sereteyî di xala § 4 an de were dîtin.

(11) Hûn dikarin li Qanûna Dibistanê xala §55a) û rêzîknameya dibistana sereteyî ya di pêvekê de ye, binêrin

Heke zarokên di nava komê de li dibistanên qada/herêma dibistana tîna xwestin, bijîn, hûn dikarin vê weke sedemekî hewce ji bo (têkiliya xurt) hevalbendiya di navbera zarokan de diyar û daxwaz bikin û bibêjin ku hûn dixwazin zarokên wan bi hev re dest bi dibistanê bikin. Dema dê û bavên zarokên din jî daxwazên we bînin ziman, ev wê ji bo qebûlkirina daxwaza we baştir bibe. Hingî zarok bi zaraka/ê din re li dibistanê tîna qeydkirin. An na dikare, zarok bi zarokên din yê li polên dersên paralel tîna, cuda werin dabeşkirin. Ji ber sedemên di qanûna dibistanan û rêzicknameya dibistanên sereteyî de hatine diyarkirin; şansê serkeftina bi vî awayî yê serlêdanê xurttir dike.

Dîsa dê û bav dikarin, zarokên xwe li Dibistanên Taybet (Privatschule) jî qeyd bikin. Dibistanên taybet heqê dibistanê distînin û dê kîjan zarokan qebûl bikin, ew dibistan bi xwe biryar didin.

MUAYENEYA BIJÎŞKÎ YA JI BO DIBISTANÊ

Hemû zarokên temenê wan gihîştine dema dibistanê, berî destpêka dibistanê, ji aliyê saziya tenduristiyê ya zarok û ciwanan ve tîna muayenekirin. Dê û bav herî dereng hetanî dema qeydkirinê wê agahdariyên bêtir bistînin.

Di vê muayeneya bijîşkî/doktorî de tîna pirsîn ku zarok di malbatê de bêtî almanî bi kîjan zimanî an zimanan diaxivin. Divê hûn teqez vê mijara zimanê malbatê diyar bikin. Sedemên vê yê sereke mîna di qanûna dibistanan di xala 15. de hatiye destnîşankirin, ku heta niha di qeydkirina dibistanê de zimanê/n malbatê nehatine tomarkirin.

Dê û bav di dema serdana doktorê dibistanê de divê belgeyên jêrîn bi xwe re bibin (12):

- Deftera muayeneyê (Deftera zer)
- Deftera derzîya perpûnê
- Heke hebe berçavk, cîhazê guh yê ji bo bihîstinê
- Dema ku hûn bi înternetê jivanekê bixwazin, divê hûn pirsnameyê dagirin. Ev pirsname tenê bi zimanê almanî û îngilîzî heye.

PÊŞNIYARÊN JI BO AMADEKIRIN Û BIRÊVEBIRINA CIVÎNÊN DÊ Û BAVAN

Baş bawer bin ku li ba hemû dê û bavan broşura "Qeydkirina dibistanê - çawa tê çêkirin" (13) heye. Dîsa divê hûn bawer bin, ev broşura rojane/nû ye. Mixabin, nuha ji bo daxistinê, bi tenê broşurên bi zimanê îngilîzî, tirkî, erebî û ûkraynî hene. Heke dê û bavên koçber ku hîn bi pergala/sîstema dibistanên li Berlinê baş nizanin, hebin divê hûn broşura "Nû li Berlinê" jî bistînin, ku ev broşur bi 9 zimanan heye (14).

Em pêşniyar dikin ku hûn, nûnerên, dê û bavan û têvî perwerdekarên bi hev re civîne amade bikin û piştgiriya hev bikin. Di nava dê û bavên zarokên pêşdibistanê de mamosteyeke/î polê xwedî ezmûn/tecrûbe hebe, ji bo amadekarî û birêvebirina civîne dikare alîkariyê bike.

Di vexwendinê de, hûn ji hemû dê û bavan daxwaz dikin ku dibistana xwe ya berpirsiyar nas bikin (15) (heke ji wan dê û bavan qeydkirin berê hatibe xwestin ji xwe ew agahdar in) û di derbarê vê dibistana berpirsiyar de di Rêbera Rêveberiya Senatoyê û malpera wan ya înternetê de agahiyên pêwîst dikare bînin peyda kirin. Gelekê caran agahdariyên di derbarê dibistanan de yê ji heval û nasên tîn bihîstin, ne li gorî girîngiya dê û bavan ne û carna jî ew agahî êdî ne derbasdar in



(13) Li girêdanka ya materyalên pêvekî binêrin

(14) Li girêdanka ya materyalê pêvekî binêrin

(15) Girêdanka diyarkirina dibistana berpirsiyar di pêveka materyalê de ye.

CIVÎNA DÊ Û BAVAN A KOMIKÊN PÊŞDIBISTANÊN PIRZIMANÎ, YANÎ KOMIKÊN TEVÎ ZAROKÊN ALMAN Û YÊN MALBATÊN ZIMANÊN DIN

Amadekarî: Dê û bavên ku ji bilî almanî zimanekî wan din, yê malbatê heye, dikarin, agahdariyên ji bo dersa zimanê xwe ya zarokan di broşura „Qeydiya dibistanê - wisa ye“ an jî di înternetê de bibînin.

Heke di komika Pêşdibistanê de dê û bavên baş bi almanî nizanibin, hebin bi navbênkariya wergêr/tercumanan, an bi alîkariya dê û bavên bi almanî dizanin, an jî perwerdekarên bi zimanê wan dizanin peyda bikin. Pêvajo (16).

Bila bi we re qertên metaplan, pênuş û xalên mezeloq (kesk, zer û sor) amade bin. Hûn dikarin navên dibistanan li ser qertan jî binivîsin. Ev ji bo civîna dê û bavan, ji aliyê demê de hêsanî ye.

Plansaziya çalakiya bernameya ji bo 2 saetan

Dom	Naverok	Materyal/Têbinî
10 deqe	Silavdan, rojev û danasîna wergêr	
5 deqe	Ji dê û bavan daxwaz bikin ku ew biçin dibistanên xwe yê têkildar/berpirsiyar	Navê hemû "Dibistanên Berpirsiyar" li ser qertan binivîsin û wan li her aliyên odeyê belav bikin, mînak li ser maseyan belev bikin.
10 deqe	Pirs: Tu xwe çawa hest/his dikî? - di nava komekê de - bi tenê Çawa ku dê û bav his dikin, dibe ku zarok jî derdora wisa his bikin. Di dema biryardayînê de divê haja mirov ji vê mijarê jî hebe.	Dê û bav dikarin dîsa rûnin.

15 deqe	Destpêka mijara sereke: Amadekariya ji bo qeydkirina dibistanê	Ji rêberê agahiyên ku bi komê re têkildar in, hilbijêrin û pêşkêş bikin.
10 deqe	Fragen beantworten oder als Erkundungsaufträge an Freiwillige weitergeben	Alle "Zuständigen Schulen" auf Karten schreiben und im Raum z.B. auf Tischen verteilen
5 deqe	Fordern sie die Eltern auf, sich noch einmal zu ihrer zuständige Schule zu stellen: Das ist der sichere Schulplatz, den bekommt das Kind bestimmt. Dann wechseln die Eltern, die für ihr Kind eine andere Schule wählen möchten, zu ihrer Wunschschule . Die anderen bleiben stehen.	Evtl. Karten nachschreiben
10 deqe	Hûn vê carê çawa his dikin? Dê û bavên vê carê li ber dibistanê bi tenê dimînin, dikarin bibêjin ku zarokê wan, zarokên din yê li derdor û taxa wan hevalên xwe nas dikin ku bi tev re biçin vê dibistanê.	
20 deqe	<p>Nuha kesên ku ne dibistanên berpirsiyar dibistanên din xwestine, sedemên hilbijartina xwe yê ji bo van dibistanan waha fînin ziman:</p> <p>a) Ji ber xwişk û birayên wan li vê dibistanê ne</p> <p>b) Ji ber ku hevalên wan yê têtikilîyên wan herî baş li vê dibistanê ne</p> <p>c) Ji ber daxwaziya ku ev dibistan Dibistaneke Têkel/telihev (Gemeinschaftsschule) e.</p> <p>d) Ji ber giraniya dibistanê li ser muzîk, huner an werzîşê/sporê ye.</p> <p>e) Ji ber hebûna teşwîqkirina zimanê malbatê/zimanê dayikê (ESU), (an zimanê biyanî yê yekemîn fransî, duzimanî û pêşkêşiyên zimanê dibistana ewropî</p> <p>f) Dibistana Taybet (Privatschule)</p> <p>Nuha dê û bav ji xwe re qerteke ku navê Dibistana Berpirsiyar li ser nivîsiye û li ser wê qertê xala bi rengê kesk nîşankirî distînin. Dê û bavên ku dibistaneke cûda dixwazin jî li ser qerta xwe navê wê dibistana dixwazin dinivîsin. Gava ew hîn dibin ku şansên wan ên dibistana daxwaz dikin zêde ye, ew wê bi xalek zer nîşan dikin. Lê heke şansê wan nediyar an ne baş be, ew xalek sor digirin. Kesên ku hîn lêpîrsîn nekirine divê bi lezgîni berî qeydkirinê vê lêpîrsînê bikin.</p>	
10 deqe	<p>Li forma qeydkirinê nivîsandina daxwaziya dibistaneke din bi tenê têrê nake. Divê dê û bav hîn bibin/bibînin ku li dibistana hilbijartine şansê wan çiqas heye. Hewce ye ku dê û bav haj jê hebin ku ji bo vê yekê hin cudahî hene. Dema ji bo dibistana daxwaz dikin, heke çend sedem hebin, ev dikare ji bo xwesteka wan bibe alîkar.</p> <p>Dê û bavên ku ji bo zimanê xwe yê dayikê li dibistana berpirsiyar e, teklîfekê nebîne, divê vê mijarê ji dibistanê bipîrsin. Bi taybetî li navçeyê pêşdibistan û pêşdibistanên duzimanî yê ku zarokên bi zimanê zarokên wan yê dayikê diaxivin yê xwe qedykirine hene an na, jî bipîrsin û bi zarokên bi heman zimanî ne yê hatine qeydkirin, bi sazî û komên ziman yê koçberan re têtikilî bê danîn. Divê ji bo bicihanîna erk û mafên dê û bavên yê bi dibistanan re têkildar agahî bînin stendin.</p>	
25 deqe	Wekî din	

CIVÎNÊN DÊ Û BAVAN AN PÊŞDIBISTANÊN PIRZIMANÎ

Gelek dê û bavên zarokên wan li Pêşdibistanan ne, qutibir dixwazin ku zarokên wan bi du zimanan heta bi sê zimanan jî hînbûnê berdewam bikin. Ev li herêmê di pola sêyem de bi zimanê îngilîzî û fransîzî jî pêkan e. Ji bona zimanên din jî vebijarkek/alternetîfek heye: Ev di hefteyê de 2 saet Dersên zimanê yekem/zimanê dayikê (DZY-ESU) (17) ye. Ji ber ku her sal li Pêşdibistanan komikên biçûk hene, li herêmê/taxê komikên bi vî awayî dikarin bên damezirandin. Gava ji yekê zêdetir li Pêşdibistanan komikên zimanan hebin, ew dikarin bi hev re pêwendiyê çêbikin û bi hev re tevbigerin. Ji bo ku gelek zarok karibin li dibistanekê bigihêjin hev, divê dibistanên guncaw bên dîtin, bi wan dibistanan re têkilî were danîn û hûn daxwaziya xwe ya ji bo zimanê yekem ji berpirsiyarên dibistanan re diyar bikin. Dema we dibistaneke ku dixwaze komika zimanê yekem bide avakirin, tidarekê dîtina mamoste û çavkaniya aborî bibîne, peyda kir, hingî ew dibistan dikare, li ba Senatoyê Şaxa Perwerde, Ciwan û Malbatan serlêdanê bike(18). Dîsa hûn dikarin, ji bo pola zimanê yekemîn, agahdariyan ji kesên di lîsteya jêrîn de ne, têkevin nava têkiliyê an jî ji broşûra “Qeydiya dibistanê- bi vî awayî pêk tê/tê çêkîrin” xwe agahdar bikin. Li Berlinê ji bo zimanên xwe, Dibistana Ewrûpa (SESB) hebe jî bi gelemperî rêya dibistanê ji bo malbatan gelekî dûr e. Ji bo karê zimanê yekem li navçeyan di serê lîsteyê de cih digire. Lê ji bo dema nêzîk hûn nikarin bi vî yekê bawer bin. Lewma jî ji bo divê li dibistaneke sereteyî ya dersên bi du zimanan hene, hûn vê xwesteka xwe ji rêveberiya senato û dibistanên navçeyê re diyar bikin. Heta nuha ev dibistanên duzimanî tenê ji bo tirkî-almanî hene. Ma gelo çima ev ji bo zimanê we jî tune be?

Plansaziya çalakiya bernameya ji bo 2 saetan:

Dom	Naverok	Materyal / Têbinî
5 deqe	Bixêrhatin û rojev	
10 deqe	<p>Pirsa sereke: We çima ji bo zaroka/ê xwe ev Pêşdibistan hilbijart?</p> <p>Bila dê û bav sedemên hilbijartina xwe li ser qertan binivîsin. Li ser her qertê tenê mijarek tê nivîsîn. Ji dê û bavên bixwazin ku bersivên xwe binivîsin û li dep/texte daliqînin.</p> <p>Bersivan li gorî mijaran kom bikin.</p>	Qert û qelemên kulavî

(17) Di hin belgeyan de hîn jî ji Zimanê yekemîn re "Hînkirina zimanê dayikê" (HSU) tê gotin.

(18) Saziya Perwerde, Ciwan û Malbatan ya Senatoyê, ji bo têkiliyê agahî di rûpela 17 an de.

10 deqe	Piştgiyariya duzimanî ji bo dê û bavên gelo çiqasî girîng e? Kî dixwaze ku ev ziman di dibistanê de were hînkirin?	
20 deqe	<p>Destpêka mijara sereke: Amadekariya ji bo qeydkirina dibistanê - ji bo zimanan li jor binêrin. Qeydkirin her dem li dibistana berpirsiyar tê çêkirin. Bêguman li wê dibistanê ji bo zarokan wê cihek hebe. Heke dê û bav dibistaneke cûda dixwazin, di dema qeydkirinê de divê ji bo wê forma/kaxeza serlêdanê dagirin. Ku dibistana bijartî ji ber sedemên cih nikaribe zarokan qebûl bike, wê di meha nîsan an gulanê de dê û bavên di derbarê wê mijarê de agahdar bike û li dibistaneke cuda cihek bê peyda bikin. Ji bo ji dibistana hilbijartî, çêkirina forma qeydiyê bi serê xwe têrê nake, divê dê û bav bizanibin ku li wê dibistana ku daxwazî kirine, çiqasî şans û derfetên wan hene. Hinek cudahiyan divê dê û bav zanibin hene, hewce ye ku ew ji van cudahiyan haydar bin. Heke ji bo dibistana daxwazkirine çend sedem (ji yekê bêtir sedem) hebin, ev dikare ji bo qebûlkirinê bibê hêsanî û alîkarî.</p>	Ji Rêberê agahiyên di derbarê komê de hene hilbijêrin û pêşkêş bikin.
10 deqe	<p>Ji bo derfetên koma zimanê xwe komên guncaw ava bikin:</p> <ul style="list-style-type: none"> • Dersên zimanê biyanî inglîzî an fransî • Xwensin û nivîsandina bi duzimanî almanî-tirkî • Dibistana Ewropa SESB • Dinbistana Duzimanî ya • Taybet <p>Dê û bav dikarin, di komên xwe de li ser derfet û pêşniyarên hene, agahdariyên xwe bi hev re par bikin.</p>	
10 deqe	Ji koman bixwazin, agadariyên peyda kirine çi ne û hîn çi pirsgrêkên wan hene, bila bi hev re par bikin.	
20 deqe	Li ser pirsên ku hîn nehatine çareser kirin, di nava xwe de li hev bikin: kî, wê çi, bi kê re û kengî bike, ji bo wê biryara hevdîtineke din ya nû bidin.	Li ser pano an jî dep/textê nivîsê binivîsin.
5 deqe	Di dawiya mijarê de, dê û bav daxwaz dikin ku divê zarokên wan biçin kîjan dibistanê (dibistana berpirsiyar an jî dibistana ew dixwazin).	Hemû "Dibistanên berpirsiyar" û dibistanên tîn xwestin, li qertan binivîsin û wan li odeyê wek mînak li ser maseyan belav bikin.
10 deqe	<p>Pirs: Tu xwe çawa his dikî? - di komê de - bi tenê</p> <p>Dê û bav xwe çawa his dikin, zarok jî dikarin di vê derdora nû de xwe wisa his bikin. Dema dê û bav biryara xwe didin, divê haja wan ji wê hiskirinê jî hebe. Dê û bavên bi tenê li ber dibistanekê dimînin, hewl didin ku zarokên din ji derdor an taxa xwe yê wan nas dikin bibînin û ew bi zarokên wan re bi hevalî tev biçin dibistanê.</p>	
20 deqe	Wekî din	

PÊVAKA MATERYALAN

Viertes Gesetz zur Änderung des Schulgesetzes Vom 27. September 2021

§ 15 Förderung von Zwei- und Mehrsprachigkeit

(1) Schülerinnen und Schüler, deren Erstsprache eine andere als Deutsch ist, werden mit allen anderen Schülerinnen und Schülern gemeinsam unterrichtet, soweit sich aus Absatz 2 und der auf Grund des Absatzes 4 erlassenen Rechtsverordnung nichts anderes ergibt. Alle von den Schülerinnen und Schülern gesprochenen Sprachen werden bei der Aufnahme in die Schule durch die Schulleiterin oder den Schulleiter oder eine von ihr oder ihm beauftragte Lehrkraft erfasst. Die für das Schulwesen zuständige Senatsverwaltung erhebt landesweit die von den Schülerinnen und Schülern gesprochenen Sprachen als Grundlage für eine faktenbasierte und wissenschaftlich begleitete Förderung von Zwei- und Mehrsprachigkeit.

(2) Schülerinnen und Schüler, deren Erstsprache eine andere als Deutsch ist und die die deutsche Sprache so wenig beherrschen, dass sie dem Unterricht nicht ausreichend folgen können, so dass eine Förderung zu Beginn in Regelklassen nicht möglich ist, können vorübergehend in besonderen Lerngruppen zusammengefasst werden, in denen auf den Übergang in Regelklassen vorbereitet wird. Die Kenntnisse in der deutschen Sprache werden bei der Aufnahme in die Schule durch die Schulleiterin oder den Schulleiter oder durch eine von ihr oder ihm beauftragte Lehrkraft auf Grund wissenschaftlich gesicherter Testverfahren festgestellt.

(3) Schülerinnen und Schüler, deren Erstsprache eine andere als Deutsch ist, erhalten Angebote für ergänzenden Unterricht in ihrer Erstsprache, sofern dies schulorganisatorisch möglich ist. Hierzu können schulübergreifende Lerngruppen gebildet werden. Der Erstsprachliche Unterricht unterliegt der staatlichen Schulaufsicht.

(3a) Alle Schülerinnen und Schüler erhalten nach Maßgabe des Haushaltsplanes Angebote zur Entwicklung von Zwei- und Mehrsprachigkeit, sofern dies gewünscht und schulorganisatorisch möglich ist. In Kooperation mit dem frühkindlichen Bereich soll ein Angebot möglichst durchgängig bis zum Schulabschluss gestaltet sein. Es wird insbesondere von immersiven Sprachlernmethoden sowie von der Möglichkeit, Sachfachunterricht in einer Zweit- beziehungsweise Fremdsprache zu erteilen, Gebrauch gemacht.

(3b) Schülerinnen und Schülern, die mehrsprachig aufwachsen, kann auf Antrag eine nichtdeutsche Erstsprache als zweite Fremdsprache anerkannt werden.

(4) Die für das Schulwesen zuständige Senatsverwaltung wird ermächtigt, das Nähere zu den Voraussetzungen und zur Ausgestaltung des Unterrichts für Schülerinnen und Schüler, deren Erstsprache eine andere als Deutsch ist, sowie zur Förderung der Zwei- und Mehrsprachigkeit für alle Berliner Schülerinnen und Schüler durch Rechtsverordnung zu regeln, insbesondere

-
1. die Voraussetzungen für die Aufnahme in Regelklassen und in besondere Lerngruppen nach Absatz 2,
 2. die Grundlagen und Verfahren zur Feststellung der Kenntnisse in der deutschen Sprache und der Erstsprache,
 3. die Maßnahmen zur schulischen Integration für zuziehende Kinder und Jugendliche,
 4. die erstsprachlichen, bilingualen und immersiven Angebote,
 5. die Anerkennung einer Erstsprache, die eine andere als Deutsch ist, als zweite Fremdsprache im Sinne des Absatzes 3b,
 6. das zeitweise Abweichen von den Maßstäben der Leistungsbewertung für Kinder und Jugendliche, bei denen das Fehlen hinreichender deutscher Sprachkenntnisse festgestellt ist.“

Schulanmeldung - so geht's, Broschüre der Senatsverwaltung für Bildung, Jugend und Familie, erscheint jährlich; Deutsch in gedruckter Fassung erhältlich; Englisch, Türkisch, Arabisch und Ukrainisch nur als Download:

<https://www.berlin.de/sen/bildung/schule/bildungswege/grundschule/anmeldung/>

Informationen über die Berliner Schule: Die Broschüre „**Neu in Deutschland**“ mit gibt es in neun Sprachen: in Deutsch, Englisch, Arabisch, Farsi, Französisch, Rumänisch, Serbisch, Russisch und Türkisch. Hier ist der Link: <https://www.berlin.de/sen/bildung/schule/berliner-schulen/schulwechsel-nach-berlin/>

Schulgesetz § 55a) Aufnahme in die Grundschule: <https://www.schulgesetz-berlin.de/berlin/schulgesetz/teil-v-schulverhaeltnis/abschnitt-ii-aufnahme-in-die-schule/sect-55a-aufnahme-in-die-grundschule.php>

Auszug:

(1) Schulpflichtige Kinder werden von ihren Erziehungsberechtigten nach öffentlicher Bekanntmachung an der für sie zuständigen Grundschule angemeldet.

Diese ist diejenige Schule, in deren Einschulungsbereich die Schülerin oder der Schüler wohnt (§ 41 Abs. 5)....

(2) Die Erziehungsberechtigten können den Besuch einer anderen Grundschule unter Darlegung der Gründe beantragen (Erstwunsch).

Dem Antrag ist im Rahmen der Aufnahmekapazität und nach Maßgabe freier Plätze gemäß den Organisationsrichtlinien nach den folgenden Kriterien in abgestufter Rangfolge stattzugeben, wenn

1. der Besuch der zuständigen Grundschule längerfristig gewachsene, stark ausgeprägte persönliche Bindungen zu anderen Kindern, insbesondere zu Geschwistern, beeinträchtigen würde,

2. die Erziehungsberechtigten ausdrücklich ein bestimmtes Schulprogramm, ein bestimmtes Fremdsprachenangebot, den Besuch einer Primarstufe der Gemeinschaftsschule oder eine Ganztagsgrundschule in gebundener Form oder offener Form oder eine verlässliche Halbtagsgrundschule wünschen oder

3. der Besuch der gewählten Grundschule die Betreuung des Kindes wesentlich erleichtern würde, insbesondere auf Grund beruflicher Erfordernisse.

Im Übrigen entscheidet das Los.

Über den Antrag entscheidet das zuständige Bezirksamt im Benehmen mit der jeweiligen Schulleiterin oder dem jeweiligen Schulleiter der aufnehmenden Grundschule.

(3) Schulpflichtige Kinder, die auf Grund einer Änderung des Einschulungsbereichs nicht mehr in dem Einschulungsbereich der Grundschule wohnen, die als zuständige Grundschule von einem älteren Geschwisterkind besucht wird, werden auf Antrag der Erziehungsberechtigten den Schülerinnen und Schülern gleichgestellt, die in diesem Einschulungsbereich wohnen.

Bei einem Antrag nach Satz 1 wird diese Schule zu der für sie zuständigen Grundschule.

(4) Kann die Schülerin oder der Schüler nicht gemäß dem Erstwunsch ihrer oder seiner Erziehungsberechtigten in die von ihnen ausgewählte nicht zuständige Grundschule aufgenommen werden, ist Absatz 2 auf Zweit- und Drittwünsche anzuwenden, sofern nach Berücksichtigung der Kinder im Einschulungsbereich und der Erstwünsche noch freie Plätze zur Verfügung stehen.

(5) Für Grundschulen oder einzelne Züge an Grundschulen, die auf Grund einer Rechtsverordnung (§ 18 Abs. 3) als Schulen besonderer pädagogischer Prägung eingerichtet worden sind, werden abweichend von Absatz 1 keine Einschulungsbereiche festgelegt.

:
:

(8) Die Absätze 1 bis 7 finden auf die Aufnahme in die Primarstufe der Gemeinschaftsschule entsprechende Anwendung mit der Maßgabe, dass Plätze für außerhalb des Einschulungsbereichs wohnende Kinder gemäß § 54 Absatz 5 bereitgestellt werden.

Grundschulverordnung § 4 Aufnahme und Zuweisung: <https://www.schulgesetz-berlin.de/berlin/grundschulverordnung.php>

§ 4 Aufnahme und Zuweisung 1, 4, 5, 6, 7, 10, 16, 18

(1) Die Aufnahme in die Grundschule und in die Primarstufe der Gemeinschaftsschule sowie der Integrierten Sekundarschule erfolgt nach §§ 54, 55a des Schulgesetzes.

Die Termine für die Anmeldung werden von der Schulaufsichtsbehörde jährlich festgelegt und öffentlich bekannt gegeben.

(2) Die Erziehungsberechtigten erhalten spätestens bei der Anmeldung Informationen über die Organisation der Schulanfangsphase, der verlässlichen Halbtagsgrundschule und des Ganztagsangebots, das Schulprogramm sowie das Fremdsprachenangebot der Schule und die sich daraus ergebenden Auswirkungen für den weiteren Bildungsweg.

Werden gemeinsame Einschulungsbereiche gebildet, sind sämtliche darin befindliche Schulen als zuständige Schule im Sinne von § 55a Absatz 1 Satz 1 des Schulgesetzes anzusehen.

Sofern die Erziehungsberechtigten nicht den Besuch der nach § 55a Absatz 1 des Schulgesetzes zuständigen Schule wünschen, informiert diese darüber schriftlich oder elektronisch innerhalb von zwei Wochen ihren Schulträger und die stattdessen gewünschte Schule.

(3) Einschulungsbereiche können insbesondere auf Grund schulischer Betonungen, der Einrichtung von Klassen mit zweisprachiger deutsch-türkischer Alphabetisierung und der Organisation als Ganztagschulen in gebundener Form so festgelegt werden, dass auch Schülerinnen und Schüler aus anderen Einschulungsbereichen aufgenommen werden.

Einschulungsbereiche von Gemeinschaftsschulen sind so zu gestalten, dass mindestens ein Drittel der Plätze für Schülerinnen und Schüler zur Verfügung steht, die außerhalb des Einschulungsbereichs wohnen.

(4) Zunächst werden im Rahmen der Aufnahmekapazität alle Kinder aus dem Einschulungsbereich in die zuständige Schule aufgenommen, deren Erziehungsberechtigte den Besuch dieser Schule wünschen.

Danach werden die Kinder aus dem Einschulungsbereich zugewiesen, die an einer gewünschten anderen Schule keinen Platz erhalten haben.

Soweit danach noch freie Plätze vorhanden sind, werden Kinder aus anderen Einschulungsbereichen, deren Erziehungsberechtigte den Besuch dieser Schule wünschen, entsprechend der Rangfolge der in § 55a Absatz 2 des Schulgesetzes genannten Kriterien aufgenommen.

Dabei werden zunächst alle Erstwünsche berücksichtigt, danach die Zweitwünsche und schließlich die Drittwünsche.

Für die Aufnahme an inklusiven Schwerpunktschulen bleibt § 37a des Schulgesetzes und für die Aufnahme von Schülerinnen und Schülern mit sonderpädagogischem Förderbedarf bleiben die §§ 19 und 33 der Sonderpädagogikverordnung unberührt.

(5) Ist die nach § 55a Absatz 1 des Schulgesetzes zuständige Schule eine gebundene Ganztagschule, eine Gemeinschaftsschule oder eine Schule, an der alle Züge denselben fachlichen Schwerpunkt haben, weist der Schulträger den Kindern, die die zuständige Schule nicht besuchen sollen, unter Berücksichtigung der Wünsche der Erziehungsberechtigten einen Platz an einer Schule mit einem anderen Angebot zu.

(6) Wird die Zuweisung an eine nicht gewünschte Schule erforderlich, erhalten die Erziehungsberechtigten von der zuständigen Schulbehörde unverzüglich, spätestens aber drei Monate vor Beginn des Schuljahres, einen schriftlich begründeten Bescheid.

Sofern keine Aufnahme in der zuständigen Schule möglich ist, sind weitere Wünsche der Erziehungsberechtigten hinsichtlich der Wahl der Schule im Rahmen der organisatorischen Möglichkeiten zu berücksichtigen.

Ist wegen fehlender Kapazität die Zuweisung an eine in einem anderen Bezirk gelegene Schule erforderlich, ist zwischen den betreffenden Bezirken rechtzeitig das Einvernehmen herzustellen.

(7) Jede Klasse in der Schulanfangsphase besteht grundsätzlich aus 23 bis 26 Schülerinnen und Schülern.

An Schulen, an denen entweder mindestens 40 Prozent aller Schülerinnen und Schüler nichtdeutscher Herkunftssprache sind oder an denen die Erziehungsberechtigten von mindestens 40 Prozent aller Schülerinnen und Schüler von der Zahlung eines Eigenanteils zur Beschaffung von Lernmitteln befreit sind, und in Klassen mit Schülerinnen und Schülern

mit sonderpädagogischem Förderbedarf beträgt die Größe der Klasse davon abweichend 21 bis 25 Schülerinnen und Schüler.

Davon abweichend kann der Schulträger nach Vorgaben der Schulaufsichtsbehörde für inklusive Schwerpunktschulen niedrigere Frequenzen festlegen.

(8) Für Schülerinnen und Schüler, die länger als drei Monate keine öffentliche Schule oder eine genehmigte Ersatzschule oder eine entsprechende deutsche Schule im Ausland besucht haben, entscheidet die zuständige Schule über die zu besuchende Jahrgangsstufe. Dabei werden der bisherige Bildungsgang, das Alter und der Lernentwicklungsstand berücksichtigt.

Wünsche der Schülerinnen und Schüler und ihrer Erziehungsberechtigten sind nach Möglichkeit einzubeziehen.

Hînbûna ziman: Pêwenda rûpela ji bo agahî û broşurên li ser zimanên li dibistanên Berlinê, di nava zimanên biyanî, hînkirina zimanê yekem, xwendin û nivîsandina duzimanî ya almanî-tirkî, perwerdeyê û ji Dibistanên Ewrûpî yên dewletê:

<https://www.berlin.de/sen/bildung/schule/besondere-schulangebote/staatliche-europaschule/>

Dibistana berpirsiyar: <https://www.bildung.berlin.de/Umkreissuche/>

Ji bo pêşdibistanan wergêr: Wergera ji bo pêvajoya pedagojîk: <https://www.dolpaep.de/>

Navendên psîkolojiya dibistanê û şewirmendî ji bo piştgiriya perwerdeyê (SIBUZ):

<https://www.berlin.de/sen/bildung/unterstuetzung/beratungszentren-sibuz/>

Ji bo Piştigiriy a Zimanê Malbatê Pêwendî û Hejmarâ Telefonên Kesên Têkildar



Café8TV - Sprachcafé Vietnamesech (Qehwexaneya Ziman a Wîetnamî)

Cihek ji bo hayraza wîetnamî li her kesî, bi taybetî jî li zarokan, belav bike.

Pêwendîdar: Luong Thanh Thùy

E-Mail: sprachcafe.vietnamesisch@gmail.com

Ziman: Wîetnamî, îngilîzî û almanî



Zaki e.V. (Komela Zaki)

Şewirmendiya penaberên efganî, li ser mijarên pratîk û pirsgerêkên civakî/sosyal Ji bo kesên erebîaxêf şîretên giştî

Pêwendîdar: Omed Arghandiwal

www.zaki-ev.de

Ziman: Dari, farisî, erebî, persî/farisî û almanî



Sources d'Espoir e.V.

Sources-d'Espoir e.V. (Komela Sources d'Espoir)

Zêdeyî duwazdeh salan e, li ser mijarên girêdayî perwerde, çand, întegrasyon û teşwîqkirina beşdariya kesên koçber yên li Almaniyayê xebatan dike. Pêwendîdar:

Rachel Nangally

E-Mail: sources-despoir@quellederhoffnung.de

www.sources-despoir.de

Ziman: Mabî, fransî, îngilîzî û almanî



Bocconcini di cultura e.V. (Komela Bocconcini di cultura e.V.)

Ji bo zarokan heftane kursên zimanê îtalî pêşkêş dike. Komele çalakîyên cuda li dar dixê, agahîyan belav dike, li ser perwerdeya duzimanî an pîrzimanî civîn, gengeşî û geştan amade dike û şîretan dide.

Pêwendîdar: Ilaria Bucchioni +49172 310 49 58

www.bocconcini.net

info@bocconcini.net

Ziman: Îtalî û almanî



Karussell e.V (Komela Karussell)

Armanca vê komelê xurtkirina nasnameya kesane û çandî ya zarokên ji malbatên duzimanî yên almanî-rûsî ne û piştigiriya dê û bavên wan li ser pêşvebirina mijarên perwerdeya pîrzimanî ye.

Pêwendîdar: Tatiana Matytsina +49 015162424627

www.karussell-ev.de

mail@karussell-ev.de

Ziman: Rûsî, ûkraynî, gûrcî û almanî

Initiative La Familia Fettuccini (Însîyatîfa La Familia Fettuccini)

Ji bo zarokên temenê wan di navbera 6 û 10 an de bi zimanê îspanî, kursên xwendin û nivîsandinê dide. Duzimanî/pirzimanîya çalak û rêzdar dike bingeh, malbatên bixwazin, tevî zarokên xwe, zimanê xwe yê dayikê biparêzin, ji bo wan şêwirmendiyê dike.

Pêwendîdar: Laura Gutiérrez Serpa +491793617264

www.lafamilafettuccini.com

info@lafamilafettuccini.com

Ziman: Spanî, îtalî, înglîzî û almanî



MaMis en Movimiento e.V. (Komela MaMis en Movimiento)

Komeleya Dayikên îspanyolîxêv e, hem di warê civakî-malbatî û hem jî di warê sazîbûnê de, duzimanî, pirzimanî û tevlêbûna civaka Almanayê pêş dixê û teşwîq dike. Pêwendîdar: Annie Mulcahy

E-Mail: info@mamisenmovimiento.de

www.mamisenmovimiento.de

Ziman: Spanî, înglîzî û almanî

SprachCafé Polnisch e.V. (Komela Qehwexaneyê Ziman a Polonî)

Cihê ji bo ziman û ragihandin, civînên vekirî û hînbûnê.

Pêwendîdar: Agatha Koch +490160 9968 0059 www.sprachcafe-polnisch.org

kontakt@sprachcafe-polnisch.org

Ziman: Polonî, fransî û almanî



Koopkultur e.V. (Komela Çanda Hevpar)

Komeleyeke li ser çanda/kultura hevkarîyê ye. Huner, perwerde, jiyana kar û jiyana hevpar. Pêwendîdar: Petronela Bordeianu +490177 4219797

<https://www.facebook.com/koopkultur/>

info@koopkultur.de

Ziman: Romenî, ûkraynî & almanî



Bilingua e.V. (Komela Duzimanî)

Pêwendîdar: Christina Litrán

Telefon: +49 176 51047611

E-Mail: info@berlin-bilingua.de

Web: <http://berlin-bilingua.de/de/bilingua/>

Ziman: Portekîzî û almanî





**Deutsch-Libanesische-Freundschaftsbrücke e.V.
(Pira Dostaniya Alman û Lubnanan)**

Pêwendîdar: Naji Awada
Telefon: +49 1725771951
E-Mail: info@deutsch-libanesische-Freundschaft.de
Web: deutsch-libanesische-freundschaft.de
Ziman: Erebi û almanî



Hellenische Gemeinde zu Berlin e.V. (Civata Helen ya li Berlin)

Pêwendîdar: Christina Fronista
Telefon: +49177 4219797 / +49 (0)30 7929587
E-Mail: info@gr-gemeinde.de
Web: www.gr-gemeinde.de
Ziman: Grekî/yûnanî û almanî



YEKMAL e. V.

Verein der Eltern aus Kurdistan in Deutschland

(Yekîtiya Malbatên ji Kurdistanê li Almanyayê)

Pêwendîdar: Günay Darici (Rêvebir)
Cornelia Rasulis (Cîgira Rêvebir)
E-Mail: info@yekmal.de
Web: <https://yekmal.com/>

Ziman: Kurdî (kurmancî, zazaki û soranî), tirkî, erebî, îngilîzî, fransî, farisî, urdî & almanî



**Türkischer Elternverein in Berlin - Brandenburg e.V.
(Komela Dê û Bavên Tirk li Berlin-Brandenburgê)**

Pêwendîdar: Turgut Hüner
Telefon: +49 (030) 614 32 99
E-Mail: info@tevbb.de
Web: <http://www.tevbb.de/home.html>
Ziman: Tirkî û almanî

Aktorê Girîng:

Senatsverwaltung für Bildung, Jugend und Familie

(Rêveberiya Senatoyê ya ji bo Perwerde, Ciwan û Malbatan)

Mijarên bingehîn yê perwerdeya giştî ya dibistanan

Teşwîqkirina pirzimanî li gel dersên zimanê yekem, xwendin û nivîsandina

duzimanî bi almanî-tirkî (ZwErz) û di derbarê vê perwedeyê de agahdarî

Xanim Evrim Soylu

II D 5 So kordînasyon û piştgiriya teknîkî ESU û ZwErz

Bernhard-Weiß-Straße 6, 10178 Berlin

E-Mail: evrim.soylu@senbjf.berlin.de

ÇAPGERÎ

Weşanger: Sources-d'Espoir e.V.

Ev xebat, ji aliyê "Generation AFRO"2023 ve di çarçeveya projeya Întegrasyona Senatoyê ya Xebat û Karên Civakî, Komîseriya Întegrasyonû Koçberî û Beşdariyê wek bernameya Întegrasyonê tê destek kirin.

Kordînasyon | Marita Orbegoso, migraUp! Rêveberiya projeyê
Dîzayn | Laura Gutiérrez
Edîtoriya naverokê | Monika Rebitzki
Pêşkêşî | Katarina Niewiedzial, berpiryara Senatoya Berlinê ya
Întegrasyon û Koçberiyê
Pêşkêşî | Buroya Navçeyê ya Întegrasyon û Beşdariyê Pankow

Ev xebat bi însiyatîfa Komxebata Lingua Pankow & Pankowê hatiye destpêkirin, destekkirin û alîkarî tê kirin!

Ji bo piştgirî û alîkariya wergerê, em ji van saziyan re, spasdariyên xwe pêşkêş dikin:
Café8TV - Sprachcafé Vietnamesisch, SprachCafé Polnisch e.V., MaMis en Movimiento e.V., Koopkultur e.V., Sources-d'Espoir e.V., Karussell e.V., Zaki e.V., Projekt To Spiti, Yekmal e.V. & Türkischer Elternverein in Berlin - Brandenburg e.V.

Ev rêber ji pênc zimanan bêtir hatiye wergerandin.



La Familia Fettuccini

Respektvolle mehrsprachige Erziehung



Sources d'Espoir e.V.



Partizipations- und Integrationsprogramm

Die Beauftragte des Senats für Integration und Migration

Senatsverwaltung für Integration, Arbeit und Soziales

BERLIN

